Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1123 | 6-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Pelên palmiye di destên jinan de vediguhere hunerê

**Jinên Filistînî di atolyeya ku vekirin de ji darên palmiye xemilandin, selikan çêdikin û mîrateya çandê heta roja me ya îro tînin.**

Xeza- Darên palmiye ku ji hawirdorên germ û şil hez dikin, yek ji cureyên daran ên herî berbelav li welatên Rojhilata Navîn in. Taybetmendiya herî girîng a darên palmiye ew e ku qurmên wan ên pir xurt û pir mezin hene. Darên palmiyeyên ku du cureyên wan ên wek gûz û xurme hene, li hin bajarên mezin li kêleka rêyan tên çandin ji ber ku bajar xweş xuya dike, lê di darên palmiye de gelek karanînên din hene. Dema ku darên palmiye di warên tevn, rûnê nebatî û şekir de têne bikar anîn, hilberên wekî selik, xalîçe û xemil ji qurm û pelên wan têne çêkirin.

Komek jinên Xezayê mîrateya çêkirina hunerên destan ji pel û darên palmiye ku ji dapîrên xwe wergirtine, bi Studyoya Hunerê ya ku ava kirine, nifşê nû fêr dikin û ji xwe re kar peyda dikin.

**'Bi jinan re karkirin cihê kêfxweşiyê ye'**

Perwerdekar Soha El-Mejdelewî ku dibêje ew ji pel û darên palmiye kêl û pêlên malê yên xemilandî û selikan çêdikin, tekez dike ku karê hevbeş bi jinan re dilxweşiyeke mezin e, û wiha gotinê xwe berdewam kir:"Karkirin hestek xweş e. Ew pîşeya dapîra min bû. Ji nû ve zindî kirina vê pîşeyê û xebata bi jinan re di hawîrdoreke wiha de me ji hemû neyînîyên jiyanê dûr dixe. Dema ku ez wextê xwe li vir derbas dikim ez vedigerim salên ciwaniya xwe. Jinên ji temenên cuda bi hev re hevaltî û hevgirtineke xweş nîşan didin. Ev me gelek kêfxweş dike. Ev hunera destan çanda gelê Filistînê ye."



**'Em tecrubeyên xwe parve dikin'**

Yek ji perwerdekaran Sumaya Karso jî diyar kir ku ew ji jinên rastî destavêtin û şîdetê hatine re şêwirmendiya derûnî dikin û ev pîşe wek hobî fêr bûye û wiha got: "Karê ku ez dikim pir giran e, ji ber vê yekê zexta ku ez li ser kare xwe digrim hewl didim bi vê hobiye xwe rehet bikim. Pêdiviya hemû jinan bi hawîrdoreke wiha heye. Li vir em tecrubeyên xwe bi jinan re parve dikin, em bi hev re xwe hîs dikin. Ji zarokatiyê ve pêwendiya min bi hunera destan re heye. Ev yek ji sedemên ku ez hatim vê kursê ye."

**Armanc ji bo jinan çavkaniyên nû yên debarê avakirinê ne**

Yek ji damezrînerên Art Desk Studio Mona Al Shawa diyar kir ku armanca wan ew e ku mîrateyek çandî ji nû ve zindî bikin û wiha pê de çû:"Xebatkirina bi pelên palmiye di heman demê de aborî ye, ji ber ku metiryalek domdar, hawirdorparêz e ku karmend rehet dike. Mîna ku xweza ketibe malê û ger bi axê re têkel bibe, bêyî ku zirarê bide wê dihele. Ez hêvî dikim ku bi hunerên destan ên ku em çêdikin, li derveyî Şerîda Xezayê bazarekê çêbikin. Armanca me ji bo jinên ku di bin dorpêçê de qadên debarê xwe ava bikin."

**NÛ-JINHA**

# Hîlala Zêrîn perwerdeya wêneyan dide zarokan

**Tevgera Çandê ya jinê Hîlala Zêrîn di afirandina çanda azad de giraniyê dide ser perwerdekirina zarokan. Hewil dide wênevanên zarok ên şoreşê biafirîne.**

Hîlala Zêrîn ku xwe spart Tevgera Çanda Jinê ya Kevana Zêrîn û di sala 2020'î de hate ragihandin, ji bo pêşketina zarokan giranî da ser perwerdeya çand û hunerê. Li Qamişlo, Hesekê, Şehba û Firatê zarokan dike, her wiha dibe alîkar ku zarok li nava civakê, li nava malbatê xwedî kesayeteke serkeftî be. Servîsa Hîlala Zêrîn hefteyê du rojan li nava malan digere, zarokan kom dike û li hev dicivîne. Zarok li baxçeyê navendê dest bi rojê dikin, ne tenê wêneyan xêz dikin, her wiha bi komên ji muzîk, govend û şano jî demê derbas dikin, piştevaniya hev dikin. Li vî baxçeyî ku ji bo zarokan hem qada



qursên perwedeyê vekir û tevkariyê li pêşketina zarokan dike. Di nava Şoreşa Rojava de ku li gel şoreşeke civakî û siyasî ye her wiha şoreşeke çand û hunerê ye, zarok ji gelek aliyan ve têne perwerdekirin.

Hîlala Zêrîn li navenda çand û hunerê ya li Qamişloyê perwerdeya wêneyan dide 13 zarokan. Zarokên ku ji salekê heta sê salan perwerdeyê dibînin li vê navendê têdigihêjin. Zarok hefteyê du rojan bi du saetan perwerdeya xêzkirina wêneyan a bi boyax û pênûsê dibînin. Her zarok piştî perwerdeya bingehîn dest bi xêzkirinê dikin û li gorî asta xwe ya pêşketinê jî derbasî qonaxeke din dibe.

**Têkiliyên germ û xurt**

Çêkirina wêneyan ku tevkariyê li pêşketina mejî, hestewarî û civakî ya perwerdeyê ye, hem jî qada lîstikê ye, liv û tevgereke rengîn heye. Bi vê aktîvîteya civakî zarok her wiha ji xwe re hevalên nû jî peyda dikin.

**Parastina hişê dîrokî**

Wêne ku aktîvîteyeke zîhnî ye, her wiha hişê mirovan jî xurt dihêle, baldarî û konsantrasyonê zêde dike. Dibe ku zarok bibin xwedî hunerekê. Çêkirina wêneyan her wiha dibe sedem ku zarok bi hunera xwe bihese, potansiyela xwe nîşan bide. Bi vî rengî zarok hîn bêhtir ji xwe bawer dikin. Hîlala Zêrîn zarokên bi çandên cuda mezin bûne li hev kom dike û hevkariyeke çandan jî diafirîne. Zarok di wêneyên xwe de sembolên çanda xwe jî nîşan didin û bi vî rengî dibin xwedî hişekî dîrokî.

### Sudoku: Bersiv 34

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 4 | 2 | 5 | 3 | 8 | 6 | 7 | 1 |
| 3 | 7 | 8 | 1 | 4 | 6 | 9 | 5 | 2 |
| 6 | 1 | 5 | 2 | 7 | 9 | 3 | 4 | 8 |
| 5 | 6 | 9 | 8 | 2 | 4 | 7 | 1 | 3 |
| 2 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 4 | 8 | 9 |
| 4 | 8 | 7 | 9 | 1 | 3 | 2 | 6 | 5 |
| 1 | 9 | 4 | 3 | 5 | 7 | 8 | 2 | 6 |
| 8 | 5 | 6 | 4 | 9 | 2 | 1 | 3 | 7 |
| 7 | 2 | 3 | 6 | 8 | 1 | 5 | 9 | 4 |

### Sudoku:Pirs 35

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 4 | | | 9 | 8 | | | |
| | | | | 2 | | 3 | | |
| | | 2 | | | | | 6 | 8 |
| | | 7 | | | 1 | | 4 | 9 |
| | 9 | 4 | | | | 8 | 1 | |
| 5 | 6 | | 8 | | | 7 | | |
| 2 | 1 | | | | | 5 | | |
| | | 5 | | 8 | | | | |
| | | | 7 | 1 | | | 3 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Keçel e ji ber wê:**
- Ji xwe ditirse; sûcê wî heye.

**Kerê guhê berxê girt, dîsa kerê kir qarîn:**
- Yê neheq xwe xwedîheq nîşan da.

**Kesê rûn nexwe bi simbêlan ve namîne:**
- Ku mirov tiştek nekiribe hin bêjin jî ciyê xwe nagire.
- Ku miriov tiştek nekiribe gotin li ser mirov nayên gotin.

**Ket gûyê wî:**
- Wî pirsgirêk jê re derxistin; di rûyê wî de ket nava pirsgirêkan; ew bû sedem ku teşqele hatin serê wî.

**Kumê wî avêt nava ziyanan:**
- Sûcdar kir; sûc avêt stûyê wî.

**Li ser cemidî:**
- Ket stûyê wî/xist stûyê wî.

**Li ser cemidand:**
- Xist stûyê wî.

**Li min bar kir:**
- Xist stûyê min; ez sûcdar kirim.

**Mirîşkên min nînin dora mala min zîrç e:**
- Haya min ji tiştekî nîne ez têm sûcdarkirin.

**Nayê qenciyê:**
- Bi kêrî wî qasî nayê ku mirov qenciyê pê bike; mirov qenciyê pê re dike ew dixeyide.

**Nehên xwe bi ser dehên min xistin:**
- Digel ku ew neheq bû jî ez neheq derxistim.

**Pê ve zeliqandin:**
- Sûc xistin stûyê wî.

**Pîrê tir kiriye û pîrê ne qayîl e:**
- Dema yek sûcekî dike û di ser de jî hêrs dibe hingê tê gotin.

**Qet destê xwe neşû û tev apê xwe nan nexwe:**
- Tu sûcdar î xwe veneşêre, ez bi te dizanim; tu derewan dikî.

**Qûnşil e:**
- Sûcek kiriye.

**Stiriyan neavêje ber lingê min:**
- Li pêşiya min nebe asteng.

**Sitiriyan bi destê min neçine:**
- Sûcên xwe nexe stûyê min.
Sîrê ji pîvazê re got, wir ve here bîn ji te tê:
- Yê sûcdar yê din sûcdar dike.

**Şeko peko navê xwe li hevalê xweko:**
- Ew sûcdar e, sûc dixe stûyê hevalê xwe.

**Ti kes nakeve gora ti kesî:**
- Wê her kes hesabê sûcê xwe bide.

**Tiliya xwe pê ve kir:**
- Nîşan da; gilî kir.

**Tiliya wî di navê de heye:**
- Haya wî jê heye; ew jî tevlî wî karî bûye.

**Tira xwe neke qûna min:**
- Sûcê xwe nexe stûyê min.

**Tira xwe dixe qûna me:**
- Sûcê xwe dixe stûyê me.

**Wê melê ji keşê re bigota 'kîrdev' keşê jê re got:**
- Yê sûcdar yê ne sûcdar sûcdar kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Çalakiya Dîlên Azadiyê di roja 10'an de didome



Çalakiya Girava Birçîbûnê ya Dorveger ku di 27'ê Mijdarê de, bi armnca tevlîbûna kampaniya cîhanî ya azadiya Rêber Abdullah Oaclan li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hatibû destpêkirin di roja xwe ya 10'an de berdewam e.**R-3**

## 'Bi vîn û berxwedaniya gel wê dorpêç têk biçe'

Li Herêma Şehbayê ji ber dorpêça hikumeta Şamê cereke din jiyan rawestiya ye. Endamê Kombenda Efrîn a Civakî Xelîl Mihemed diyar kir ku ev nêzî 6 sala ne ku dorpêça hikumeta Şamê li ser gelê Efrîn û Şehbayê berdewam dike, armanca dorpêçê jî şikandina vîn û hêviyên gel e.**R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1123 | 6-Berfanbar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# GELÊ KURD WÊ TEKEZ BI RÊBERTIYA AZAD BI SER BIKEVE

Gelê Kurd Rêber Apo weke siberoj û xeta xwe ya sor dibîne. Daxwaz dike ku bêyî hincet bi Rêber Apo re demildest hevdîtin bên destpêkirin. Divê demildest hevdîtina parêzer û malbatên wan bê kirin. Divê demildest pergala faşîst a ku tecrîd û îşkenceyê bi salan e dimeşîne, bi dawî bibe. Hewldanên ji bo tecrîdkirina Têkoşîna Azadiyê ya gelê Kurd û vîna Kurdan a di şexsê Rêber Apo de hatiye nîşandan, wê bê encam bimîne. Gelê Kurd wê teqez bi Rêbertiya azad bi ser bikeve.**R-3**




## Hevkarî û dijberî

Di serî de kampaniya cîhanî ya azadiya Rêber Apo bi hemû coş, kelecan û hêza xwe berdewame û ji gelek aliyên cîhanê, gelê Kurd û dostên Kurdan tevlîbûna xwe ji vê kampaniyê re çêdikin. Ji bona ku ev kampaniya biserbikeve ji hemû milî ve û di serî de li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê bi gelek çalakiyên cûr bi cûr ev kampaniya tê meşandin û wê heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere her berdewambe.**R-4**



## 'Tedawiya xwezayî Çareya tevahî nexweşiyan e'



Navenda Nînîhorsax bi tedawiya xwezayî ji pirsgirkên civakê yên tendirustî re dibe çareserî. Rêvebera Navenda Nînîhorsax Şêrîn Welat diyar kir ku bi riya tedawiyên xwezayî mirov her zindî dibe û got, armanca me vegerandina civakê li tedawiya xwezayî ye.**R-2**

## Heyva Sor a Kurd li gorî pêwîstiya demê pirojeyan pêk tîne

Rêveberê Ofîsa Birêvebirina Pirojeyan a Heyva Sor a Kurd Sîpan Xelîl diyar kir ku Heyva Sor a kurd her 2 salan konferansa xwe li dar dixe. Herwiha da zanîn ku ew li gorî pêwîstiya demê û ji bo xizmeta gel pirojeyan pêk tînin.**R-6**

Nehîr pale — **Dayîkeke 81 salî li Tirkiyê tê girtin** R-2

Dilyar Cizîrî — **Roja mafê mirovan tenê diruşmeyeke bikar tînin!** R-4

Zekî Bedran — **Biratiya kuştin û înkarkirinê!** R-5

Farûk Sakik — **Meşa 'Ji Rêber Apo re Azadî'** R-5

Kemal Necim — **Çalakiyên çandî.. eger û armanc... çend têbînî..** R-7

# ‘Tedawiya xwezayî Çareya tevahî nexweşiyan e’

Navenda Nînîhorsax bi tedawiya xwezayî ji pirsgirkên civakê yên tendiruştî re dibe çareserî. Rêvebera Navenda Nînîhorsax Şêrîn Welat diyar kir ku bi riya tedawiyên xwezayî mirov her zindî dibe û got, armanca me vegerandina civakê li tedawiya xwezayî ye.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Ji kevnariya jiyanê ve her dem ên ku bi xwezayê re eleqedar dibin jin in. Bi destên jinan tov û xweza hatin kişifkirin û bi demê re ji xwezayê derman hatin çêkirin. Jinan bi destên xwe nexweşî derman dikirin. Ev taybetmendiya jinê ye ku heta niha jî derdikeve holê û dermanên xwezayî çêdikin û derdora xwe tedawî dikin. Li ser vê bingê jinan bi derfetên xwe ji bo pêşxistina tedawiya xwezayî di sala 2020’an de Navenda Nînîhorsax ya tedawiya xwezayê li bajarê Qamişlo vekirin. Di derbarê Navenda Nînîhorsax ya tedawiyên xwezayî û desteka psîkolojîk rêvebera wê Şêrîn Welat û bijîşka jinan Olga Rûs ji rojnama me re axivîn.

Şêrîn Welat diyar kir ku wan li ser tedawiyên xwezayî gelek lêkolîn û lêgerîn kirin e û wiha got: “Kar û xebatê me yên tedawiyên xwezayî di sala 2016`an de li herêma Efrînê hat destpêkirin. Li Efrînê li ser cureyên giya û sûdên wê ji bo tedawiyên xwezayî me gelek lêkolîn û lêgerîn kirin, ev lêkolîn kurahiya çavkaniya civaka xwezayî li welatê me nîşan da.Ji bo xwedêderketina li tedawiya xwezayî pilanên me hebûn ku em pêmangeheke bijîşkaya xwezayî ava bikin, armanca me jî perwerdekirina mirovan li ser tedawiya xwezayî bû û naskirina biyolojiya laşê mirov, lê mixabin piştî dagirkirina Efrînê plana me pêk nehat. Armanca me ne tiştekî biçûk bû, lê ji ber kêm derfet, me xwe spart li ser derfetên heyî û bi hejmarek jin me navenda Nînîhorsax vekir. Herwiha dema kar û xebatên me yên tedawiyên xwezahî li bajarê Qamişlo hat destpêkirin, wê demê cihê me teng bû û zehmetî di aliyê kar û xebatê de dihatin kişandin, piştî demekê me cihê xwe guhert da ku em karibin xebatên xwe berfirehtir bikin, beşên wê li pêşbixin û perwerdeyan bidin.”

### Beşên Navenda Nînîhorsax

Şêrîn Welat di berdewamiya axaftina xwe de balkişand ser beşên navendê û girîngiya her beşekî û wiha got: “Tevhiay beşên navenda tedawiyên xwedî girîngiyeke taybet in. Destpêkê di navendê de bijîşka enerjiyê, beşê mesaj û derûnî hebû, piştre gav bi gav me xwest karê xwe berfireh bikin. Amûrên ku em li ser xebatê dikin, amûra derxistina zeytê ye, bi wan zeytan mesajê ji bo tedawiyên nexweşiyan, estetîka por, pirsgirêkên laş û hwd bi kar tînin, ji sala 2022’an heya 2023’yan kar û xebat me di vê çarçûveyî dihat meşandin. Niha beşa jinan jî hatiye vekirin. Herwiha me peyman bi fêrkarê yuga re jî çêkiriye, ji bo ku beşê werzîşa yuga jî di navendê de bê vekirin.”

### ‘81 cûreyên tedawiyên xwezayî hene’

Şêrîn Welat da zanîn ku armanca wan ji vekirina navenda tedawiyên xwezayî, sûdwergirtina mirovan ji xwezayê li pêş keve û wiha got: “Armanca me ji vê xebatê ku mirovan vegerînin xwezayê. Herwiha mirov bighêje zanebûna ku xwe bi xwe tedawî bike. Xebatên me herî zêde li ser perwerdê ye ku mirovan di aliyê tedawiyên xwezayî de zane bikin. Gelek beşê tedawiyên xwezayî hene, dema ku dibêjin tedawiyên xwezayî mirov tenê di giyan dihizirin, giya yek beşê tedawiyên xwezayî ye, lê 81 cûreyên tedawiyên xwezayî hene, ji wan 81`an 51` ji holê hatine rakirin, ev jî ji ber zextên sîstemên desthilatdar e ku ji bo berjewendiyên xwe mirovan neçarî tedawiya kîmyawî dikin.”



Şêrîn Welat



Olga Rûs

### ‘Nînîhorsax xwedaya şîfa û zanînê ye’

Şêrîn Welat derbarê wateya navê navendê wiha got: “Nînîhorsax hekîma çiyayên jorîn e û yekem xwedaya şîfai û zanînê ye. Li gorî mîsyolojiya wê di navber Çiyayê Zagiros û Toros de beriya 5hezar sal B.z mirî zindî dikirin. Digotin piştî mirina mirov bi 72 demjimiêran nû ruh ji laş derdikeve, Nînîhorsax dikarîbû di wan 72`ê Seatan de ruhî mirov careke din zindî bike. wisa me navê navendê li ser navê wê kir, ji bo ku em karibin mîna wê bibin ronahiyek, herwiha heskirina tedawiya bi riya xwezayê, di civakê de ava bikin.”

### ‘Mirov ji bo xwe her zindî be’

Şêrîn Welat axaftina xwe wiha qedan: “Gelek caran deramnfiroş ji bo tedawiya xwe tên navendê dermanên xwezayî dibin, ji ber ku ew dizanin dermanên kîmyayî çiqas bandorkê neyênî li tendurisitiya wan dike. Dermanfiroş ji bo berjewendiyên xwe yê madî tu carî rastiyê ji civakê re nabêjin. Lê em ji berjewndiyên civakê kar dikin. Em civak bi xwe ne. Civak çiqas xwe zane bike û pêşbixe ewqas berjewndiyê xwe diparêze. Di civaka xwezayî de dermanxane û bijîşk nebûn tenê tedawiyên xwezayî bûn. Civak heta ku zindî be divê li hemberî astengiyan hêviyan di xwe de ava bike.”

### Di sala 2023’an de beşê tedawiya jinan hat aktîvkirin

Derbarê heman mijarê de pijîşka jinan Olga Rûs diyar kir ku di vê salê de wan di navendê de beşeke taybet ji bo jinan jî vekirû wiha got: “Ji bo alîkariya jinan me îsal beşek taybet ji bû nexweşiyên jinan jî vekir. Hin amûrên pêwîst jî me anîn. Banga min ji bû jinan ew e ku di derbarê pirsgirêkên bijîşkî ku bi we re derbas dibin, serdana navenda me bikin, da ku em bi wan re bibin alîkar, herwiha em derbarê tendiristiya wan de perwerdeyê bidin wan.”

# Li Şengalê cara yekemîn ji bo jinên Ereb dewreya perwerdeyê

**Ji bo cara yekemîn jinên Ereb li Şengalê dewreya Perwerdeya Şehîd Hebûn Ereb li Akademiya Şehîd Rojbîn bi şahiyekê bidawî kirin. Di şahiyê de 45. Salvegera Damezirandina PKK’ê jî hate pîrozkirin û daxwaza azadiya Rêber Ocalan hate kirin.**

Li Şengalê hemû pêkhateyên herêmê bi armanca xwe rêxstinkirina li ser pergala neteweya demokratîk xebatên perwerdeya fikrî didomînin. Vê carê 15 jinên ciwan yên gundê Bîrcarî yê herêma Ereba ya Şengalê dewreyek ya perwerdeya fikrî biserkeftî bidawî kirin.

Dewreya perwerdeyê binavê Şehîd Hebûn Ereb li Akademiya Şehîd Rojbîn hate dayîn. Perwerdeyê 15 rojan berdewam kir.

Dewreya yekemîn a ku hatibû destpêkirin bi dawî bû. Bi dawîkirina dewreya perwerdeyê 45’emîn salvegera damezrandina PKK’ê jî hate pîrozkirin û banga azadiya fîzîkî ya Rêberê Ocalan hate kirin.



Şahiyê bi deqeyek rêzgirtinê destpê kir û pişître li ser navê dewreya Şehîd Hebûn Ereb, Zîna Adil axivî. Zîna dewreya perwerdeyê li tevahiya jinên ereb pîroz kir û da diyakrin ku bi saya fikrên Rêber Apo ew dikarin li ser azadiya jin û pêkvejiyana gelan perwerdeya bibînin. Herwiha ji bo pêşxstina perwerdeyê banga tevlîbûnê li tevahiya jinên Ereb kir. Herwiha li ser navê Meclisa Jin ya Herêma Ereban jî Ewêşe Muhed axivî. Ewêşe salvegera damezrandina PKK’ê pîroz kir û destnîşankir ku ew wek gelê Ereb minetdarên Rêber Apo ne û got; “Ji ber ku wî hiştiye ku em jin karibin li ser lingên xwe bisekinin û bibin xwedî îradeya xwe. Lewra em dixwazin Rêber Ocalan bi awayek fîzîkî azad bibe.”

Herî dawî jina cawan ku beşdarî dewreya perwerdeyê bûye got: “Ev perwerde ji bo tevahiya civakê girînin, ji ber ku bi perwerdeyê em xwe nas dikin û dikarin bibin xwedî îradeya xwe. Ev îradeya me ya ku hatiye avakirin bi saya fikir û ramanê Rêbertiya me ye. Pêwîste em jî li Rêber Apo xwedî derkevin.”

Piştre govenda azadiyê hate gerandin û piştî govendê şahiya bidawîbûna dewreya perwerdeyê bidawî bû.

## Ji Pênûsa Jin

### Dayîkeke 81 salî li Tirkiyê tê girtin

Nehîr Pale

Dayîka Kurd Mekbûle Ozer dema ku daxwaza mafên xwe dike ne sûc e. Aliyê siyasî, olî û civakî mafê her ferd û civakê heye ku hebûna xwe biparêze û daxwaza azadiyê bike. Dewleta şerê taybet Tirkiyê di hemû şert û mercan de Kurdê ku xwe inkar neke, zimanê xwe biparêze û xwedî li nasnameya xwe derbikeve dibe hedefa wan. Rejîma Tirkiyê gelê Kurd ji zarokan heyanî ixtiyaran hedef digre. Mîna dayîka Mekbûle Ozer û Emîne Şanyeşar. 2022`an 10`ê Gulanê dayîka Mekbûle Ozer tevî hevjînê xwe Hadî Ozer bi hinceta alîkariya PKK`ê kirine ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatin girtin. Cezayê 2 sal û mehek dan Dayîka Mekbûle, piştî ku demekê di girtîgehê de ma ji ber temenê wê mezin bû û pirsgirêkên wê yên tendurûstiyê hebûn dadê biryar da ku girtina dayîka Mekbûle taloq bikin û ew 7`ê Îlonê 2022`an ji girtîgehê derket. Dayîka Mekbûle li ser kopal dimeşe û temenê wê 81 sale, exlaqî û wijdanî kî vê yekê bibhîze gelekî aciz dibe. Tirkiyê ku dewleta şerê taybet e çima dayîkeke Kurd ku temenê wê 81 salî ye bigrin.
Dayîka Emîne Şanyeşar jî ji sala 2018`an ve edaletê dixwaze. Ew jî dayîkeke Kurd e, ji Pirsûsê ya Rihayê ye. 14`ê Hezîranê sala 2018`an hevjîn û du kurên wê ji aliyê xizm û parêzvanên parlamenterê AKP`ê Yê berê Îbrahîm Halîl Yildiz ve hatin qetil kirin. Dayîka Emîne Şanyeşar têkoşîna xwe berdewam kir û 9`ê Adara 2021`an dest bi nobeta adaletê kir. Niha jî bi hinceta `heqaret li Îbrahîm Halîl Yildiz ê AKP`î hatiye kirin` doz li hemberî dayîka Kurd Emîne Şanyeşar hatiye vekirin.
Saziyên dewleta şerê taybet bi van buyeran re êrîşî nirxên manewî yên gelê Kurd dike. Dayîkên Kurd bi hincetên ne exlaqî sûcdar dikin û dixwazin wan bavêjin zîndanan. Jinên Kurd ên siyasetmedar, hunermend û hwd. bi hinceta ku alîkariya PKK`ê dikin tavêjin zîndanan. Ev êrîşên dewleta Tirk a dagirker têne wateya ku aliyê îdeolojîk, siyasî û civakî jinê felc kirine.
Tevgerkirina jin cîhanî bûye û çiqasî jin ciyê xwe di têkoşînê de bigre ew qasî li ser rejîma dewletan dibe xeterî. Niha li Tirkiyê, Afxan, Îran, Sûriye, Filistîn, Îraq, Yemen, Tûnis, Hind û hwd tûndiyeke siyasî, fêzîkî, piskolojîk û aborî ya dijwar li ser jin tê meşandin. Armanc ji van êrîşan ew e ku jin were qir kirin û dawî li têkoşîna wê were kirin. Li beramberî van êrîşên ku rometa jinê û civakan dişkînin wê jin çawa parastina xwe bikin, berpirsyartiyek ji hemû jinan tê xwestin. Dayîka Mekbûle û Emîne Şanyeşar di astekî herî bilind de têdikoşin. Tiştek bandor li têkoşîna wan nake. Dayîka Şanyeşar hevjîn û du kurên xwe wenda kirin û ev bûye 999 roj ku li ber navenda dadê ya Tirkiyê edaletê dixwaze. Her çiqasî tevgerên jin, hunermend û siyasetmedarên jin destek dayîna xwe ya bi dayîka Emîne Şanyeşar re anîbin ziman jî, lê dîse ew bi tenê ma û niha li hemberî wê doz hatine vekirin û dixwazin wê bavêjin zîndanê. Divê hemû jin bibin parçeyek ji têkoşîna dayîka Mekbûle û dayîka Emîne Şanyeşar.



# Amûdê dilê şaristaniyê ye

Bajarê Amûdê dikeve bakurê rojhilatê Sûriyê, 25 km li rojavayê bajarê Qamişlo ye, ji aliyê bakur ve rûbirûyê bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê ye, 160 gund girêdayî wê ne, herwiha gelek şûnerwarên kevnar dihewîne.

**Navenda Nûçeyan/ Qamişlo**

Bajarê Amûdê dikeve bakurê rojhilatê Sûriyê, 25 km li rojavayê bajarê Qamişlo ye, ji aliyê bakur ve rûbirûyê bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê ye. Hejmara niştecihên wê tevî gundewarên wê nêzî 200 hezar kesî ye û piraniya wan kurd in. Herwiha xirstiyan jî bi jimareke kêm li bajêr hene û bajar komek dêrên dîrokî yên herî kevn diparêze. 160 gundên wê hene, praniya wan gundê kurdan e.
Li başûrê Amûdê zêdeyî 10 gundên kurdên Êzidê hene. Ew li gundên Amudê yên Merkebê, Dugirê, Qelaçix, Xirbê Xwê, Çetelê, Kuliyê, Xirbexezal, Gorseîd, Xirbedilan, Mîk, Hêşerî, Tolko, Berzan, Morîka, Enteriyê, Mehmûdiyê û Kerengo dijîn. Li 20 salên dawiyê piraniya kurdên êzdî derketin derveyî welat
Ji nivîskar û helbestvanên navdar yên ku li Amûdê Mezin bûne û ji bo pêşketina nivîs û helbestê kedeke wan ya mezin heye; helbestvanê navdar Cegerrxwîn, Mela Îbrahîm Sufî Ebdo, Mela Ebdulletîf Îbrahîm û Mela Ebdulhelîm Mela Îsmaîl, Elî Topez û Şêxmûs Qerqatî, Ehmed Huseyînî, Ebulhelîm Yûsif û hwd... .
Amûdê wekî navenda çandinyê ya herêma cizîrê tê nasîn, tevahiya cûreyên çandiniyê yên havîn û payîzê lê tê çandin. Herwiha praniya xelkên wê bi çandî û xwedîkirina dewaran debara jiyana xwe dikin.
Ji wan karesatên ku “Amûdê” tê re derbas bûye, bûyera şewata sînemayê di sala 1960 de ye, ku tê de nêzîkî 250 xwendekarên ku temenên wan di navbera 7 û 15 salî de ne, jiyana xwe dest dane. Di wê bûyerê de navê Mihemed Seîd Axa derket holê, ku xwe avêt nav agir da ku hejmareke herî zêde ji zarokan rizgar bike. Lê piştî ku wî jimarek ji zarokan ji agir rizgar kir, ew di nava agir de ma û jiyanan xwe ji dest da.
Di milê şaristaniya kevnar de, Amûdê di dilê deverek mîrasê de ye ku cugrafiya wê gelek şaristaniyên kevnar dihewîne. Yek ji van şûnwaran jî ‘ Girê Mozan e, ew yek ji girîngtirîn şûnwarên herêmê bi giştî ye. Ji ber ku bermahiyên paytexta Hûrî ya yekem a berî zayînê 4 hezar sal digre nava xwe. Herwiha şûnewarên Çaxirbazar ku 35km dûrî Amûdê ye xwedî girîngiyeke mezin. Dîroknas û nivîskara Brîtanî “Agatha Christie” di salên 1930 bi hevînê xwe re Profesor Max Mallowan serdana Çxirbazar kiribû, demekê li wir ma û li ser hûrguliyên serdana xwe pirtûka xwe ya bi navê “Ez Çawa Dijîm” nivîsand.



Zanyarê îngilîz Max Mallowan di navbera salên 1935-1937an de, girê Çaxir bazar kolandiye û 15 qatên çandî yên di navbera salên 1500-3000 berî zayînê de hatine dîtin. Mîqdarên seramîkên bi spehî hatine xêzkirin, peykerên “xwedayên qencî û bereketan” û fîgurên axên girîng ên ku bi tîpên kulî yên ku ji serdema Asûrî ya kevnar (1800 B.Z.) ve hatine nivîsandin, firna çêkirina qermeyan, firaxên kevnar, kevir, bronz û amûrên hestî û alav û peykerên mirov û heywanan ji heriyê pijyayî hatine çêkirin.

# ‘Heval Kekê Min’

**Komuna film a Rojava filmê metrajdirêj “Heval Kekê Min” çêdike. Film behsa Şoreşa Rojava dike û Haşim Aydemîr derhêneriya filmî dike. Rêber Hebeş senaryoya filmî nivîsandiye. Derhênera alîkar jî Nadya Derwêş e, ew dibêje, tevî şert û mercên zehmet, girtina dîmenên filmî dewam dike.**

Filmê ‘Heval Kekê Min’ ku niha li Rojava tê çêkirin, behsa pêşketina Şoreşa Rojava, heqîqeta civakî ya şoreşê, sîstema koperatîfên meclîsan û komunan dike.
Derhênera alîkar a filmî, Nadya Derwêş û lîstikvana sereke ya film Hajîn Ebdurehman Mihemed behsa filmê ‘Heval Kekê Min’ kirin. Nadya Derwêş ji Serêkaniyê ye û ji sala 2015’an û vir ve di nava Komuna Filman a Rojava de ye. Hem derhêneriyê hem jî alîkariya derhêneriyê dike.
Nadya Derwêş anî ziman ku film ji hin aliyan ve behsa sîstema koperatîf, meclîs û komunên Şoreşa Rojava dike û got, “Sîstema nû ya li Rojava hate afirandin yan jî weke modêla jiyanê hate avakirin, wê li her derê belav bike. Me ev yek bi biratiya gelên li Rojava vegot. Li gundekî gel bi rengekî komunal dijî û jiyaneke komunal diafirîne. Di heman demê de behsa pêvajoya azadkirina bajarê Reqayê jî dike. Têkoşîna şervanên YPJ û YPG’ê ya ji bo rizgarkirina bajêr, têkiliya şervanan a bi gel re nîşan dide. Rastiya civakê û şervanan radixe pêş çavan. Nîşan dide ka şervanan û gel bi hev re sîstemeke çawa afirandiye. Ya herî girîng jî behsa wê yekê dike ku şervan ewlad, milîtan, bîrdarî, xwişk, bira û zarokên vî gelî ne. Gelek mijaran dinirxîne û bi vî rengî behsa Şoreşa Rojava dike. Bêguman behsa beşeke piçûk a rastiya Şoreşa Rojava hatiye kirin.”



### Em ji nû ve hîn dibin û hîn dikin

Nadya Derwêş ragihand ku di dema çêkirina filmî de ji ber êrişên hewayî yên dewleta Tirk wê pir zehmetî dîtine, lê wan li gel van şert û mercên zehmet jî dev ji çêkirina filmî bernedaya û got, “Ev êriş wê ti carî nebin asteng. Eger em di nava şoreşê de karên sînema yan jî hunerî dimeşînin, êriş nikarin hunera me rawestînin. Beriya her tiştî di projeyên me de mijara herî zor û zehmet, mijara lîstikvaniyê bû. Em bi rastiya gelekî welê re rû bi rû ne ku ji karên çand û hunerî bêpar e. Bi reng, çand, nasname û zimanê xwe nekarî hunerî bike, tevlî karê hunerî nebûye. Di nava şoreşê de bi derfetên xwe, bi tecrûbeyên xwe yekemcar hunerê şoreşê diafirînin. Lewma kêmasî hene. Bi taybetî tecrûbeya lîstikvanên me ji temenê şoreşê kêmtir e. Lîstikvanên di film, rêzefîlm, şanoyan de dilîzin xwedî tecrûbeyeke demdirêj a hunerî nîne, bi giranî amator in. Kêmasiyên vê qonaxê hene, lê belê encama hatiye bidestxistin hêja ye. Di nava şert û mercên şer de bi derfetên kêm em ji sifirê dest pê dikin. Bi demê re em ê bibin xwedî hunerekî pispor. Di filmê ‘Heval Kekê Min’ de hevalên pispor hene. Her wiha hevalên me yên nû jî hene ku hîna nû dest bi lîstikvaniyê kirine. Em ji nû ve hîn dibin û ji nû ve hîn dikin.”

### Em bi ruhekî kolektîf dixebitin

Nadya Derwêş anî ziman ku senaryoya filmî beriya sal û nîvekê hate amadekirin û got, “Koma teknîkê, lîstikvan û hwd. beriya sê mehan dest bi amadekariyê kirin. Hin lîstikvan di rêze filma Evîna Kurd de bûn, hinek lîstikvanên me jî tevlî karên cuda yên rêze film û filman bûbûn. Amadekariyên produksiyon û dekorê gelek wextê me xwar. Ji bo filmî maleke nû hate avakirin. Me destpêka vê mehê dest bi girtina dîmenên filmî kir. Ji bo em filmî çêkin jî pêwîstiya me bi şert û mercên guncaw ên hewayê heye. Hewa carna bi tav e, carna bi mij e, carna bi toz e. Carna em neçar in ku dîmenekî çend caran bigirin, heta ku em dîmenê bi dilê xwe bi dest bixin. Ji ber şert û mercên hewayê, hin astengî çêdibin, lê em gihîştine astekê. Lîstikvanên me xwe tevlî rola xwe kirine. Lîstikvana me ya herî piçûk 13 salî ye û lîstikvana sereke ya filmî tevî ku yekemcar e di filmekî de rol dike, hînî kar bû û bi serketî tevlî atmosfera filmî bû. Weke tîm em bi ruhekî kolektîf kar dikin.”

### Ji şanoyê ber bi sînemayê

Ev lîstikvana 13 salî Hajîn Ebdurehman Mihemed a ji Qamişloyê ye û lîstikvana 13 salî ye. Di filmê ‘Heval Kekê Min’ de bi karaktera Nûjîn a rola sereke radibe. Hajîn beriya dest bi lîstikvaniya filmî bike, di şano de rol kiribû. Hajîn got, “Min di sê lîstikên şanoyê de rol kir. Hêjayî xelata şanogera herî baş hatim dîtin. Niha di filmê ‘Heval Kekê Min’ de bi rola sereke radibim. Bêguman zehmetiyên xwe hene gava ku mirov ji şanoyê derbasî sînemayê bibe. Şano bi rengekî giştî ye, lê di filman de dîmenê bi detayan hene. Di vî warî de zehmetî hebin jî di demeke kurt de tevlî ahenga rola xwe bûm. Ez rola karakterê Nûjîn dikim. Nûjîn dema ji dayik dibe, kekê wê tevlî nava refên gerîla dibe, derfetê nabîne ku kekê xwe bibîne. Gerîlayê bi navê Baran nas dike û jê we ye ku kekê wê ye. Film bi vî rengî dewam dike.”
Hajîn herî dawî diyar dike ku li Rojava divê filmên li ser berxwedan û têkoşîna gelê Kurd, filmên li ser Şoreşa Rojava û biratiya gelan zêde bibin.

## Têbînî

### Çalakiyên çandî.. eger û armanc… çend têbînî..



Kemal Necim

Her miletek yan civakek li gorî dîroka xwe û cihê ku lê dimîne xwediyê çanda xwe ya taybet û cuda ye. Ev çand bi gelek şêweyan tê derbirîn û vegotin, yek ji wan şêweyan û forman lidarxistina çalakiyên çandî ye.
Çalakiyên çandî yek ji wan formên ku naveroka çandî ya civakê yan beşekî civakê diyar dike. Lewma lidarxistina çalakiyên çandî ne reftareke bê armanc û tenê ji bo şahînî û kêfê ye, lê belê çalakiya çandî bi armanca pêşxistina çand, perwerde û şahiyê di nav civakê de û ji bo dewlemendkirina jiyana çandî ya takekes û civakê bi giştî têne pêkanîn.
Mirov dikare pir armancên çalakiyên çandî rêz bike, mîna, pêşxistina bîreweiya çandî, pêşxistina fêrbûn û perwerdeyê di warên curbecur ên wekî huner, wêje, dîrok, zanist û teknolojiyê de ku ev tişt dike ku zanînê berfireh bike û karîn û jêhatîbûna kesan zêde bike. Her wiha çalakiya çandî platformên danûstendina civakî û têkiliyan di navbera kes û çandên cihê de peyda dike û dibe navgîn ji bo têgihiştin û hevjiyana aştiyane ya di navbera çandên cihê de.
Çalakiyên çandî wekî din dibin alîkar ji bo pêşxistina afirandêrî û derbirîna hunerî û têvedana vegotina afirîner û pêkvejiyana hunerî ya raman û hestan, afirînerî û vegotina hunerî di kesan de zêde dike û dibe alîkar ji bo pêşkeftina şiyanên hunerî û afirîneriyê. Dîse yek ji armancên girîng yên van çalakiyan bihêzkirina xwebûn û nasnameya çandî ye, ku nasnameya çandî ya kes û civakê xurt bibe û hişmendiya çanda herêmî û gerdûnî zêde dike û nasnameya çandî û girêdana çandî ya kesan ava dike.
Titşên me li jor rêz kirin çend armancên sereke yên çalakiyên çandî ne ku ew li gorî her civakê û her çandekê û li gorî pêdiviyan têne guherîn jî.
Lewma dema ku civakek yan kesek yan saziyek bixwaze ku çalakiyeke çandî pêk bîne û lidar bixe pêwîste van eger û armancan bide ber çavên xwe û bernameya xwe ya çalakiyê li gorî wê amade bike, naverok û çawanî û başiya şêwe û formên çalakiyê li gorî van pîvan û armancan amade bike. Ji ber ku eger naveroka çalakiyê qels û kêm bû û ne li gorî van rêgez û pîvanan bû dê neghêje armanca xwe, ger neghêje armancan jî dê nebe çalakiya bi armanc, dê bibe çalakiya ji bo çalakiyê, ango çalakiyan ji bo xwe, ne ji bo civakê.
Civaka kurd a li Rojava bi salan di bin nîrên çewisandin û qedexekirina çandî de mabû. Lewma hetanî berî 10 salan mirov nikare behsa çalakiyeke çandî ya bi rêk û pêk û ji bo civakê bike.
Niha piştî 10 salên şoreşê rewşeke nû çêbû, di her beş û aliyê jiyanê de derfeta tevger û liv û çalakiya bi nasnameya Kurdî hatiya avakirin. Yek ji wan liv û tevgeran çalakiya çandî ye. Di bin siya saziyên çandî yên fermî, yan jî yekîtî û saziyên nivîskar, rewşenbîr û hunermendan de salane bi dehan çalakiyên çandî têne lidarxistin. Bê guman ev liv û tevgereke erênî û baş e. Lê hewce ye ku ev saziyên ku van çalakiyan lidar dixin carekê li paş xwe binêrin û ji xwe bipirsin ka armanca wan ya van çalakiyan çi bû û gelo wan naverok û bernameya van çalakiyan li gorî van armancan tije kiribû yan jî tenê çalakiyên ji bo çalakiyan bûn.

# Heyva Sor a Kurd li gorî pêwîstiya demê pirojeyan pêk tîne

Rêveberê Ofîsa Birêvebirina Pirojeyan a Heyva Sor a Kurd Sîpan Xelîl diyar kir ku Heyva Sor a kurd her 2 salan konferansa xwe li dar dixe. Herwiha da zanîn ku ew li gorî pêwîstiya demê û ji bo xizmeta gel pirojeyan pêk tînin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Heyva Sor a Kurd di 24`ê Mijdar de bi amadebûna 200 delgeyên xwe yên ji 44 navendên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Konferansa xwe ya 3`emîn di bin dirûşma "Bi Hêvî û Hevkarî ji bo Avakirina Pêşerojeke bi ronî" li dar xistibû, herwiha di Konfiransê de xebatên Heyva Sor a Kurd yên 2 salan hatibûn nirxandin.

Di derbarê konferansa 3`emîn ya Heyva Sor a Kurd Rêveberê Ofîsa Birêvebirina Pirojeyan ya Heyva Sor a Kurd Sîpan Xelîl ji rojnama me re axivî.

Sîpan Xelîl diyar ku Konferansa Heyva Sor a Kurd her 2 salan tê lidar xistin û wiha got: "Di 24`ê Mijdarê de me Konferansa xwe ya 3`mîn li darxistibû û destpêka Konferansê de danasîna Heyva Sor a kurd hatibû diyarkirin ku di 12`ê Berfanbara sala 2012`an de weke Rêxistinek serbixwe hatibû damezrandin û kesên ku destekê didin Heyva Sor a kurd ji bo ku karibên pirojeyên xwe bi rêve birin hatibûn diyarkirin weke (Medico, Medico International, AMB, YAW, KSC, CDO, GD, ITF, Waldensian, Swiss, Save The Children, Upp, PIN, IRC, NAP, HI) ev rêxistinên ku bi Heyva Sor a kurd re alîkarin ji bo birêvebirina pirojeyan. Herwiha di konferansê de endamên dîwanê hatin diyarkirin, rapora giştî ya Heyva Sor a Kurd ku tê



de kar û xebatên sala 2022-2023 hatibû şîrovekirin, rapora komîteya jinê hat nirxandin, nirxandina rêzikname û derxistina Hevserokên nû jî hatibûn kirin. Ji xwe Heyva Sor a kurd li gorî rêziknameya xwe, rêxistineke mirovî û ne qezencî ye, ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hatiye naskirin. Li ser nirx û zagonên navneteweyî ya tevgera Xaça Sor û Heyva Sor a Navneteweyî kar û xebatê dike, alîkariyê dide kesên hewcedar di rewşên şer, penaberî, karîsetên xwezayî û rewşên awart de."

**Heykeliya Heyva Sor a Kurd**

Heyva Sor a Kurd destpêkê ji Ofîsa Kampaniya û Birêvebirina Piroje, Ofîsa Peywendiyên Tenduristî ku ji aliyê wê ve hemû beşên tenduristiyê tên şopandin, Ofîsa Locistîk, Ofîsa WOŞ, Ofîsa Ragihandinê, Bernameya ji bo piştgirya deruniya mirov û parastinê, Ofîsa Şopandinê, Ofîsa Çavdêrî û Nirxandinê, Ofîsa Çavkaniya Mirovî, Ofîsa darayî pêk tê, niha jî Ofîsên nû hatine avakirin wek; Ofîsa Berçavkirin, Ofîsa Zagonî û Ofîsa Erşîf jî hatine avakirin.

**'Li gorî pêwistiya demê piroje pêk tên'**

Sîpan Xelîl di berdewamiya axaftina xwe de pirojeyên Heyva Sor a Kurd anî ziman û wiha got: "Pirojeyên me yên herî sereke ku ji sala 2017 û 2018`an de hatine destpêkirin û heta niha jî berdewamin wek; pirojeya Îko û pirojeyên nexweşgehên Heyva Sor a Kurd e, herwiha Yekîtiya Ewropa piştgirya hin nexweşgehên Heyva Sor a kurd dike wek; Kampa Erîşa, Ebû Xeşeb, Hol, Waşokanî (Serê Kaniyê), Kampa Mehmûdiyê li Reqa, nexweşgeha Reşîd li Reqa, Nexweşxaneya Minbic û Tebqa ya wetenî dike û ev piroje heta sala 2024`an wê dewam bike. Pirojeya 2`emîn a Korsotyom ku di aliyê guhdana tenduristî ew jî nexweşgehin, ev piroje bi giştî di warê tenduristiyê de ne, pirojeya Stes jî ji bo guhdana tenduristiyên di nexweşgehên kampa de wek kampa Waşokanî ( Serê Kaniyê) û Şedadê ku ji aliyê Heyva Sor, Upp û HI tê birêvebirin. Ji derveyî van pirojeyan, pirojeyên ku bên kirin wê li gorî pêwîstiya demê be. Ji xwe dema ku di erdhejê de li Şehba gelek ziyanên madî û canî hatibûn kirin bi riya pirojeyên Heyva Sor a Kurd û hevkarên wê jinûve avakirin pêk hatin, pirojak din jî heye ku bi riya hevkarên me yên li Başûr 130 mal li Tilqirah, Babilis û Tilsosinê werin avakirin ji bo malbatên ku di erdhejê de çûn Heleb û Şêxmeqsûdê û war tinebû lê bi cih bibin, Pirojak din jî ji bo kesên ku di girtîgeh û kampan de hewcederî nexweşaneyê bûn bên tedawîkirin. Herwiha ji aliyê Heyva Sor a Kurd ve navenda Parçeyên Mirova yên çêkirî jî ji sala 2022`an de hat avakirin."

**Pirojeyên dema pêş yên Heyva Sor a kurd**

Sîpan Xelîl projeyên Heyva Sor a Kurd yên dema pêş da xuyakirin û wiha got: "Pirojeyên me yên demê pêş jî evin; piroja parastina Sivîl ev ji bi riya Medico ye, beşek li Qamişlo û beşa din jî li aliyê Şêxmeqsûd û Şehba ye, ev piroje jî ji bo perwerdekirin civakê di demên erdhejê de ku karibin xwe biparêzin, ji ber dema ku erhej pêk hat gelek ji gel nizanîbûn çawa xwe ji erdhejê biparêzin, herwiha wê amûrên pêwîst jî bên kirîn û wê hevkariya vê pirojê jî bi Şaredarî û Saziyên Xwecih re bê kirin. Herwiha Heyva Sor a kurd wê alîkariyê bide piroja Bedxwarinî û zarok ya di kampa Serdem û Berxwedanê de. Û pisgirêka Qenalên avqirêjiyê ku li van ciyan derketibûn çareser bike. Herwiha nexweşxaneya Şewat, kansêr û telasîmiyayê ya li bajarê Qamişlo, navenda Mamogirafîk tevlî vê nexweşaneyê bû, ew jî giredayî tespîtkirina zû ya benceşêra pêsîran li cem jinan."

**'Kêmbûna alîkariyê astengiyan derdixe'**

Sîpan Xelîl di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Di Heyva Sor a Kurd de odeya operasyonan heye, ji aliyê 64 ambolansa ve tê birêvebirin, dema rewşên awirte derkevin wê agahiyê bi odeya operasyonan, ji bo ku agahiyê bidin nexweşxaneyê. Herwiha 13` xalên tenduristiyê di hundirê kampan de û 15` li bajaran hene. Navendên Heyva Sor a Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî 45 navendin. 5` Kilînokên Gerok jî ku li Reqa, Tebeqa, Dêrazorê, Minbic û Hesekê hene, ji ber gelek gund xalên tenduristiyê dûrî wê ne, ji bo wê bi riya van kilînokên Gerok xwe bighînin nexweşaneyan. Ji xwe navenda Heyva Sor a Kurd li Amûdê dermanên nexweşiyên demdirêj belav dike, lewra Heyva Sor a Kurd ji sala 2012`an ve alîkariyeke baş li Bakur û Rojhilatê li gorî derfetên xwe pêk anî, lê sal bi sal bêtir xwe bi rêxtin dike. Niha jî derdora 1200 endamî cihê xwe di nava Heyva Sor a Kurd de digire. Astengiyên ku Heyva Sor a Kurd rastî wê tên kêmbûn alîkariyê ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye."

# Êzidiyên Efrînê piştî 6 salan çûn Laleşa Nûranî

**Gulê Cefer ku çûye Laleşa Nûranî dibêje: "Laleşa Nûranî cihê hebûn û dîroka me ye û em ê heca xwe ruxmî hemû astengiyan bi merasîm û rêûresmên olî bikin."**

Êzidî salê carekê heca xwe li Laleşa Nûranî dikin, weke nirxek pîroz tê dîtin. Ev hec 7 rojan bi merasîm û rêûresmên olî berdewam dike. Her sal Êzidî ji her deverê li hev dicivin û berê xwe didin Laleşa Nûranî ji bo ku heca xwe bikin û bi vê yekê parastina adet û kevnşopiyên xwe dikin. Piştî 6 salan ji aliyê dewleta Tirk ve dagirkirina Efrînê, Êzidiyên Efrînê yên ku li kantona Şehbayê dijîn ruxmî hemû astengiyan hewl dan berê xwe bidin Laleşa Nûranî û heca xwe piştî 6 salan carek din bikin. 20 kesan ji Şehbayê û Helebê berê xwe dan Şengalê û heca xwe kirin.

Der barê çûyîna Êzidiyan ber bi Laleşa Nûranî ve û rêbazên pêkanîna heca xwe de Gulê Cefer a bi xwe jî çûbû hecê axivî û got: "Wek Êzidiyên Efrînê me moral girt û em bi hêvî ne cejna Cimahiyê ya Êzidiyan bibe cejnek aştî û mirovahiyê û bi çûyîna me ji Laleşa Nûranî re me daxwaz kir ku cih û warên me yên dagirkirî bên rizgarkirin."

**Ji ber êrişên dagirkeriyê 6 sal neçûn Laleşê**

Gulê Cefer di destpêka gotinên xwe de bal kişand ser ziyareta xwe ji bo Laleşa Nûranî li Şengalê û got: "Piştî koçberbûna me ya ji Efrînê, em nikaribûn berê xwe bidin Laleşa Nûranî û heca xwe bikin ji ber zehmetiyên jiyanî û astengiyên ku di koçberiyê de dihatin jiyîn. Li kêleka wê rê ji bo derbaskirina me ji aliyê cihên eleqedar ve nedihatin vekirin. Lê îsal û ruxmî hemû astengiyan em dikaribûn heca xwe bikin. Diviyabû ku her sal em heca xwe bikin û merasîmên xwe li dar bixin lê ji ber rê tunebû, 6 sal bûn em nikaribûn biçin Laleşa Nûranî. Ji Êzidiyên Efrînê 20 kes û ji aliyê herêma Cizîrê jî 83 kes di nav de jin û mêr em derbasî Şengalê bûn ji bo ku heca xwe bikin. Li ser rê hin astengî hatin jiyîn û nehiştin em derbasî Şengalê bibin lê piştî îsrara me em derbas bûn û gel bi şans bû ku îsal me heca xwe kir. Çûyîna me ya Laleşa Nûranî moralek mezin da me bi taybetî ji bo me koçberên Efrînê."

**'Rêûresm û merasîmên olî hatin kirin'**

Di nav gotinên xwe de Gulê Cefer destnîşan kir ku Laleşa Nûranî cihek dîrokî û pîroz e ji wan re her wiha merasîmên ku di Laleşa Nûranî de pêk anîne şîrove kir û wiha pê de çû:

"Laleşa Nûranî cihê hebûn û dîroka me ye, ew cihekî gelek pîroz e. Laleş tê wateya perestgeha yekemîn a mîr û melekan. Li gel baweriya Êzidiyan di Laleşa Nûranî de merasîm ji 7 rojan pêk tê. Tê de lavayên cur bi cur tên gotin, beriya ku roj derkeve lava tên gotin her wiha merasîma lavayên piştî derketina rojê jî tê vegotin. Rojane merasîm rêûresma olî tên çêkirin. Ev rêûresm gelek bi nirx û pîroz in. Her wiha rêûresma çêkirina xwarina Simat dihat çêkirin, Simat jî bi sê rengan dihat amadekirin, yek qurbanî dikirin û xwarin çêdikirin, yên din jî xwarina Kutayî bi du rengan amade dikin û dixwin. Rêûresma periyan jî dihat çêkirin ku rengê melekan temsîl dike."

**'Ez hêvî dikim ku warê me were rizgarkirin'**

Gulê Cefer di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku bi derbasbûna ji Laleşa Nûranî re hêvî û daxwazên xwe anîne ziman û got: "Ziyaretki-



rina Laleşa Nûranî ziyaretek pîroz e ji ber ku ew cihê xwedewandên me ye. Gorên xwedewandên me yên Fexir Dîn, Şems Dîn û Nasir Dîn di Laleşa Nûranî de hene û em moral ji wan digrin. Di hundirê Laleşa Nûranî de em cejna xwe dikin û Êzidî ji her deverê li wir kom dibin. Îsal yekem car hejmarek gelek mezin ji Êzidiyan kom bibûn û heca xwe dikirin. Mirov ji vê kombûnê hêz û moral digre. Wek Êzidiyên Efrînê me moral girt û em bi hêvî ne cejna Cimahiyê ya Êzidiyan bibe cejnek aştî û mirovahiyê û bi çûyîna me ji Laleşa Nûranî re me daxwaz kir ku cih û warên me yên dagirkirî bên rizgarkirin."



# 'Abdullah Ocalan bûye çavkaniya hêviyê ya gelan'

Aktîvîstê Belçîkî Dîego del Norte daxwaza azadiya Abdullah Ocalan kir û got, "Fikrên Abdullah Ocalan ne tenê ji bo Kurdan, her wiha ji bo tevahiya mirovahiyê bûye çavkaniya sûdwergirtinê."



**Navenda nûçeyan**

Ji bo pêngava 'Azadî ji Rêber Ocalan re, çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re' ku 10'ê Cotmehê li 74 navendên cîhanê bi daxuyaniyeke hevpar destpê kir, piştgiriya beşên cuda yên civakî yên li qada navneteweyî dewam dike.

Ji tevgerên civakî yên li Belçîkayê aktîvîst Dîego del Norte ji ANF'ê re axivî û got, paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo lêgerînerên cîhaneke nû bûye çavkaniya hêvî û sûdwergirtinê. Dîego del Norte destnîşan kir ku kampanya ji bo azadiya Abdullah Ocalan destpê kiriye girîng e û divê xwedî lê bê derketin.

**'Abdullah Ocalan ji bo gelên cîhanê bûye çavkankiya sûdwergirtinê'**

Aktîvîst Del Norte got, "Ji deverên cuda yên cîhanê, mînak mirovên li Hindistan, Fîlîpîn, Kolombiya, ji herêmên cuda yên Ewropayê paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk a Abdullah Ocalan weke bîrdoziya sûdwergirtinê dibînin" û wiha dewam kir:"Bi dîtina min, paradîgmaya Abdullah Ocalan gelekî wêrek û çavkaniya sûdwergirtinê ye ku nîşanî me dide, em bi pirsgirêkên bi heman rengî re rû bi rû ne. Gelek ji me dixwaze ku ji rêbazên kevneşop ên hînî me hatiye kirin wêdetir, bi rê û rêbazên cuda yên birêxistinkirina civakê tevbigerin. Bi taybetî mijarên netewe dewlet, sînor, nasnameyên cuda yên dema dawî timî dikevin rojevê gelekî girîng in. Li hemberî van pirsgirêkên ku em pê re rû bi rû ne paradîgmaya Abdullah Ocalan rêya rizgariyê nîşan dide."

**'Divê em ji bo azadiya wî têbikoşın'**

Aktîvîst Del Norte işaret bi girîngiya pêngava 'Azadî ji Ocalan re, çareseriya siyasî ji pirsgirêka Kurd re' kir ku 10'ê Cotmehê destpê kir û got, "Gelê Kurd û lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan mîna gelek şoreşgerên di dîrokê de li zexteke giran û tecrîdê rast tê. Abdullah Ocalan zêdeyî 20 sal in di nava şert û mercên îllegal û derveyî mirovahiyê de tê hiştin ku divê dawî li vê yekê bê anîn." Del Norte destnîşan kir ku ji bo azadiya Abdullah Ocalan divê li her derê têkoşîn bê meşandin û got, "Ocalan ji bo mirovên li çar aliyên cîhanê di nava têkoşîna avakirina cîhaneke nû de ne, dibe çavkaniya hêvî û sûdwergirtinê. Divê em daxwaza azadiya Ocalan bikin. Her wiha xwendina berhem û fikrên Ocalan wê bi kêrî me bê. Abdullah Ocalan di heman demê de nivîskarekî hilberîner e ku têkildarî dema heyî xwedî fikrên kûr e."

Herwiha girêdayî rewşa Rêbetiyê û piştî Erdheja Gemlîkê KCDK-E:Got ku fikarên me yên li ser Îmraliyê derxist asta herî jor

KCDK-E'yê ragihand ku piştî erdheja bi pileya 5,1 a li Gemlîkê fikarên li ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan derketiye asta herî jor.

KCDK-E'yê bi bîr xist ku piştî erdheja Gemlîkê 13 erdhejên herî mezin bi pileya 4,5 pêk hatin û wiha got: "Tu xeberek ji Rêber Apo ku li Îmraliyê di bin tecrîda girankirî ya faşîzma AKP-MHP'ê de dîl tê girtin, nîne. Ji bo tecrîda hatiye ferzkirin jî nikarin perdeyekî qanûnî çêbikin. Rêber Apo 24 sal in di bin şert û mercên giran ên tecrîdê de tên ragirtin, bi nexweşiyên kronîk ketiye û em tu agahiyê jê nagirin. Ji ber vê erdhejê fikarên me îro zêdetir bûye."

**Daxuyaniyê wiha dewam kir:**

"Dewleta Tirk a faşîst têkildarî rewşa tenduristî û jiyana Rêber Apo tu agahiyê nedaye û bi mehane nahêle parêzer û malbata Rêber Apo pê re hevdîtinê bikin. Em vê pergala tecrîdê ya ku li dijî rêgezên edalet û hiqûqa navneteweyî ye şermezar dikin û bang li hemû saziyên navneteweyî yên berpirsyar dikin ku erka xwe pêk bînin. Daxuyaniyên Şaredarê Bajarê Mezin ê Bûrsayê yên der barê erdheja îro de ne zelal e. Ji Rêber Apo agahî negirtin û nehiştina hevdîtina bi parêzer û malbatê re fikarên me yên der barê jiyana wî de zêdetir kiriye.

Gelê Kurd Rêber Apo weke pêşeroj û xeta xwe ya sor dibîne. Daxwaz dike ku bêyî hincet bi Rêber Apo re demildest hevdîtin bên destpêkirin. Divê demildest hevdîtina parêzer û malbatên wan bê kirin. Divê demildest pergala faşîst a ku tecrîd û îşkenceyê bi salan e dimeşîne, bi dawî bibe.

Bi cezayên displînê yên domdar û bêhiqûqiyan tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo tê nixumandin. Li dijî vê pergala giran a tecrîdê û nenaskirina wê, erka me ya sereke ye. Beriya her tiştî divê hemû saziyên me, gelê me û dostên me ji bo şikandina tecrîdê seferber bibin û pêl bi pêl pêngavê berfireh bikin.

Hewldanên ji bo tecrîdkirina Têkoşîna Azadiyê ya gelê Kurd û vîna Kurdan a di şexsê Rêber Apo de hatiye nîşandan, wê bê encam bimîne. Gelê Kurd wê teqez bi Rêbertiya azad bi ser bikeve.

Weke KCDK-E em bi boneya erdheja îro careke din daxwaz dikin ku li ser jiyan û rewşa Rêber Apo agahiyan werbigirin û bêyî ku kêliyekê jî winda bikin em li ku bin bila bibin bertekên xwe nîşan bidin."

# 212 sazî û kesayetan ji bo Silêman Ehmed bang kirin

**Ji bo Silêman Ehmed ê ji aliyê PDK'ê ve hate revandin û 43 roj in agahî jê nayê wergirtin 212 kesayet û saziyên li Başûrê Kurdistanê bang kirin.**



Edîtorê beşa Erebî ya ajansa Rojnewsê Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25'ê Cotmehê dema xwest di ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û ev 43 rojin agahî jê nayê girtin.

Ji bo azadiya rojnamevan Silêman Ehmed ji 212 kesayet, rojnamevan, rêxistin, parlamenterên berê, çalakvan, parêzer û mamosteyên zanîngehê banga lezgîn hate kirin ku di demeke zû de Silêman Ehmed bê berdan.

Banga ji bo raya giştî hatî weşandin, wiha ye:

Ji bo raya giştî:

"Zêdetirî meheke rojnamevan Silêman Ehmed ku edîtorê beşa erebî ya ajansa Rojnewsê ye, ji aliyê asayîşa Dihokê ve hatiye revandin û winda ye.

Di nava meha borî de tevî hemû hewldanên ji bo azadiya rojnamevan ên ajansa Rojnews, Kompanya ya Çetir, 10 caran tîma parêzerên Silêman Ehmed hewldan dosyaya Silêman bibînin û raste rast Silêman bibînin. Lê asayîşa Dihokê rê neda.

Heya niha rê nehatiye dayîn ku ti parêzer wekaleta Silêman Ehmed bigire û li ser dosyaya wî kar bikin. Ev jî binpêkirinek berçave. Em weke rojnamevan, mamosta, çalakvan, parêzer, kesayet û azadîxwazan dibêjin, ya ku li beramberî rojnamevan Silêman tê kirin, senaryoyek dubare ya desthilatê ye û dixwaze mîna Şêrwan Şêrwanî û girtiyên din yên Behdînanê, Silêman jî bi tometên bê bingeh ceza bike û bixe girtîgehê.

Ji bo vê, erkê hemû rojnamevan, azadîxwaz, rêxistinên navxweyî û navnetewî yên mafên mirovan ew e ku vê danûstandina desthilatê ya li beramberî rojnamevanan qebûl nekin. Ji ber ku ev yek di dema pêş de Herêma Kurdistanê ber bi pêşerojek tarî ve dibe.

Silêman Ehmed bê suce, li ser karê xwe yê rojnamevaniyê hatiye revandin û windakirin. Ewlekarî û jiyana Silêman di berpirsyartiya asayîşa Dihok û desthilatdarên Herêma Kurdistanê deye. Ji bo vê pêwîste demek ji ya din zûtir Silêman Ehmed were berdan.

# Çalakiya Dîlên Azadiyê di roja 10'an de didome

**Çalakiya Girava Birçîbûnê ya Dorveger ku di 27'ê Mijdarê de, bi armnca tevlîbûna kampaniya cîhanî ya azadiya Rêber Abdullah Oaclan li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hatibû destpêkirin di roja xwe ya 10'an de berdewam e.**

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan 25 sal in li Girtîgeha Îmraliyê di tecrîdê de tê ragirtin û 32 meh in jî bi tu awayî destûr nayê dayîn ku bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinan bike.

Bi daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd di 10'ê



Cotmehê de kampaniya cîhanî ay bi dirûşmeya 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareseriya siyasî ' destpê kir. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û kesayetên azadîxwaz tevlî kampaniyê bûn.

Di çarçoveya piştgiriya kampaniya azadiya Rêber Abdullah Ocalan, herwiha bi boneya salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê, li girtîgehên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê di 27'ê Mijdarê de çalakiya greva birçîbûnê ya dorveger ku hatibû destpêkirin, di roja xwe ya 10'an de dewam dike. Li gorî agahiyan bi giştî li 104 girtîgehan girava birçîbûnê tê meşandin.

# Rastîyeke me Kurda; Zû bawerkirina ji neyaran

**Cîger Dilşad**

Mirovên zane û azadîxwaz bi tu carî bi gotina şerefê,namûsê ya dewletê bawer nake. Çimkî hemû dewlet şûştîne ji namûs û şerefê. Soza şeref û namûsê ya herî erzan û bê pere soza dewletan e. Bi taybetî jî soza şeref û namûsê ya dewleta tirk bê pere ye û li vê dinyayê ya herî erzane. Rastîyek me Kurdan heye ku, em pir zû ji sozên dewletê bawer dikin. Ev,di kesayeta de bûye wekî taybetmendîyekê. Neyarên me jî ew taybetmendîya me baş nasîne û li gorî wê nêzî me Kurdan dibin. Gava hinekî bi me re bikenin,hema bêje em hemû kîn û nifrîna ji bîr dikin. Mînaka herî tê zanîn,Şêx SAÎD e. Dozgerê dadgehê Ehmed ORGEVREN û endamê heyeta dadgehê ELÎ SAÎB(KURDEKÎ RAWANDOZ Ê),hinek sozên vala didin Şêx SAÎD;”qala Kurd û Kurdistan’ê neke,bêje;ji boyî şerîetê rabûm serhildanê,ji xwe pişt re em ê bi hev re herin gundê we û berxekî serjêkin û bixwin” Şêxê me hema dibêje;”temam”. Di rûniştinên dadgehê de peyveke bi tenê derarê Kurd û Kurdistan’ê de nabêje. Şêx SAÎD heta celad kursîyê ji bin lingan dehf dide jî dibêj;”şaşitîyek heye,wê min berdin”. Lê di rastîyê de şaşitî filan tûne bû. Ew xapandibûn! Şêx qet negot;” van welatê me dagirkirine, welatê me parçeparçe kirine, gundê me şewitandine, bi deh hezaran welatîyên me kuştine,em birçî û tazî hiştine,tecawizî xwişk û dayîkên me kirine,her roj xwîna me dimijin!”




Mixabin,ev yeka han wekî taybetmendîyekê di kesayeta me de hatîye rûniştandin. Tevî hemû hewldanên Rêber APO û dahurandinên kesayetê ku pêşxistine,em wekî ferdên civaka Kurd nikarin bêjin ku em jê xelasbûne. Mînak;di pêvajoya 2013-2015’an de tevî hevdîtin bi Rêber APO re dihatin kirin û dewletê soz didan jî,lê Rêber APO her ev hişyarîya dikir; tiştekî zelal tûne ye,sibehê wê çi bibe ne dîyare. Lê heger şer dest pê bike, wê îcar şer qet ne wekî berê be! Bila Kurd xwe li gorî şerekî dem dirêj amade bike.” Heger me wekî civaka Kurdistan’ê xwe li gorî şerê gel yê dem dirêj amade kiriba,wê îro rewş pir û pir cuda ba. Li Rojava jî rewş zêde ji Bakur ne cuda bû. Ya rast ew e ku em Kurd wiha bifikirin;” dewlet çi sozê dide bila bide, Rêberê me 26 salin kêlî bi kêlî di zîndanê de dikujin û 50 sal e ku deşt û çîyayên me dişewitînin,bombe dikin,ziman û çanda me qedexe kirine, bi deh hezaran keç û xortên me xistine zîndanan û wan bi saxî dikujin,leşker û serbazên dewletê her roj li bajarekî tecawizî keçikeke Kurd dikin. Cih û deverên dîroka me tune dikin,her roj axa Başur bi alîkarîya MALBATA BARZANÎ didin ber top û tangan,her roj li Rojava qirkirinan pêk tînin, bi kurtasî ji bo tu tiştek li ser navê Kurdan nemîne hema her tişt tûne kir- dikin. Yanê hem fîzîkî û hem jî çandî Kurdan di qirkirinê re derbas dikin. Van kiryaran sergirtî nakin, pir vekirî û li ber çavê dinyayê dikin. Tevî van yekan, gava carekê bi me re kenîya divê em van kiryarên neyar qet û qet ji ber çavên xwe nedin alîyekî.

Gotineke Rêber APO heye,dibêje;”yê/ya ku kîn û nifrîneke wê/wî ya mezin li hember neyar tûne be,nikare serkeftinê bi dest bixe.”

Bi kurt û kurmancî; divê kîn û nifrîna me li hember dijmin timî tûj û zindî be ku em bikaribin azadîya xwe bi dest bixin. zû bawerkirina ji gotinên neyaran tê wateya xwe xapandinê! Tevî ku her tişt li holê ye û li ber çavan têne kirin,em nikarin bêjin ku “min nedît,nebihîst,nizan im”. Em wekî kesên civaka Kurdistan’ê qet tiştekî nizanibin jî,em tev dizanin ku Rêberê me di zîndanê de ye û li çar alîyên cîhanê kampaniya;”JI RÊBER APO RE AZADÎ,JI PIRSGIRÊKA KURD RE ÇARESERÎ” hatîye destpêkirin. Her hal piştî vê kampanya yê êdî em nikarin bêjin ku;agahîya min tune ye. Tişta em bikin ew e ku bi hemû hêza xwe tevlî kampanyayê bibin û pêşengtîyê jê re bikin. Divê em ji bîr nekin ku li tu devera dinyayê bêyî şerekî mezin,bêyî tevlîbûna gel a şerê gel yê şoreşgerî û demdirêj pêkhatina aştîyeke bi rûmet nehatiye kirin û nayê kirin jî.

## Roja mafê mirovan tenê diruşmeyeke bikar tînin!



**Dilyar Cizîrî**

Çend rojên din an ku 10’ê kanûnê wê cîhan pêşwaziya salvegera 75’an a Roja Mafê Mirovan a Cîhanê ku di sala 1948’an ve ji aliyê Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hatiye destnîşankirin, bikin. Di ragihandina vê rojê de bi erêkirina hemû aliyan metiryalek ji 30 madeyan pêk tê hate destnîşankirin. Di xalên wê de bi awayekî berfireh mafê mirovan li ser belgeyan hatiye nivîsandin.
Li gorî wê belgeyê ji mafê her kesî ye li kîjan aliyê cîhanê dibe, bela bibe, ji kîjan mezheb, netew an jî şeklî be, bila bibe, dikare bi azadî jiyan bike. Di heman demê de li gorî metriyalê nûnertiya hemû herêman bi awayekî qanûnî hatiye destnîşankirin, di heman demê de wekî peymanek ji aliyê hemû hikûmetên cîhanê û gelên wê ve hatiye imzekirin, hate destnîşankirin. Dewleta Tirk jî di nav de hemû welatan li ser erê kiriye. Tê îda kirin ku ji wê rojê ve zemînek bingehîn a parstina mafê mirovn di cîhanê de hatiye destnîşan kirin.
Min xwest di vê nivîsa xwe de pirsekê bikim, gelo xalên wê rastin, aliyên ew peyman imze kirine li gorî naveroka wê tevgeriya ne. Heger niha di asta cîhanê de serjimarek hate çêkirin û nêrîna hejmarek gelekî mezin a mirovan hate girtin, wê kî bêje peyman pêk hatiye, an na?
Lê bêyî tu serjimarî werin amadekirin, ên peyman imze kirine tu bawerî pê ne anîne. Em nikarin hemû mînakên binpêkirinên mafê mirovan ku di cîhanê de têne kirin, di vê nivîsê de bînin ser ziman. Têrê dike em parçeyek biçûk ji binpêkirinên mafê mirovan ên dewleta Tirk li Kurdistanê dike, bînin ziman. Di serî de em ê behsa tecrîda girankirî ya li Imralî tê kirin, bikin. Mane dewleta Tirk jî peymana mafê mirovan imze kiriye. Di heman demê de li Imralî qanûnên xwe û hemû qanûnên navdewletî yên mafê mirovan bin pê dike. Ev nêzî 3 salane bi tu awayî agahî ji Rêber APO nayê girtin. Êrişên dewleta Tirk li dijî Başûrê Kurdistanê li dijî gêrîlayên azadiyê mane hemû cûreyên çekên qedexekirî bikar tîne. Mane çekên kîmyawî li dijî xwezayê berî mirovan bikar tîne.
Li dijî Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê mane rojane êriş, komkujî û sûcên li dijî mafê mirovan pêk tîne. Zarok, jin, rojnamevan, karker û her kesî bi balafirên xwe yên bê mirov, top û tangên xwe dike armanc û dikuje. Bûyera hedefgirtina hevala me ya Rojnamevan û endama Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) Delîla Egîd ku di encamê de xebatkarê JIN - TV Necmidîn şehîd bû, yek ji sedan bûyerên li dijî mafê mirovan dike ye. Di heman demê de piştgiriya dewleta Tirk ji komên çete yên wekî DAIŞ, El-Nusra û navên wekî wan pir in, xaka Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagirkirin, niştecihên wan ên resen dan koçberkirin û li şûna wan kesên din bi cih kirin, li ber çavên herî kesî demgrafiya herêmên dagirkirine, didin guhertin.
Li Filistînê jî Hemas sivîl revandin û kuştin, Israîlê jî ji wan xirabtir kir û bi dehezaran kes kuştin û bajar wêran kirine û niha jî dibêjin Roja cîhanî ya mafê mirovan.

# Hevkarî û dijberî

**Elî Roj**

Di serî de kampaniya cîhanî ya azadiya Rêber Apo bi hemû coş, kelecan û hêza xwe berdewame û ji gelek aliyên cîhanê, gelê Kurd û dostên Kurdan tevlîbûna xwe ji vê kampaniyê re çêdikin. Ji bona ku ev kampaniya biserbikeve ji hemû milî ve û di serî de li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê bi gelek çalakiyên cûr bi cûr ev kampaniya tê meşandin û wê heyanî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere berdewambe.

Herweha di demên dawiyê de mîna rojeveke sereke ku herêm û cîhan tev pêve mijûle şerê di navbera Îsrayil û Hemasê de rûdide û bandora vî şerî di asta herêmî û cîhanî de wê rewşa heyî ber bi kûve bibe. Ji ber ku her kes li gorî geşedan û rûdanên ku diqewimin dikeve nava liv û tevgerê û li gorî wê siyaset û pilanên xwe dirêse.

Li gorî ku tê xuyakirin hevsengiyên herêmî û cîhanî bi şerê di navbera Îsrayilê û Hemasê de hîn baştir xwe dane der û rastiya şerê cîhanê yê siyemîn hîn baştir tê xuyakirin. Bi destpêkirina şerê di navbera Ukraniya, Rûsiya û eniyên şer û hevsengî û dengeyên ku li derdorê yên ku bi vî şerî re derketinê holê, bi xwere rewşeke nû derxistiye holê. Ji milekî din ve jî îro bi şerê di navbera Îsrayil û Hemasê de hîn bi rengekî baştir ev enî û alî ji hev cudadibin û rastiya şerê cîhanê yê syemîn hîn baştir derdikeve holê. Li gorî ku tê xuyakirin wê bi rewşa heyî û şerê li ser asta Rojhilata navîn û cîhanê, gelek guhertin û veguhertinan bixwe re derxîne holê û wê hemû alî bixwazin ji vê rewşa heyî sûdê werbigrin. Di serî de Nato û Sistema serdestê cîhanê ji bona pirojeya Rojhilata navîn a mezin û careke din bi sedsaliya Lozanê re dîzayineke nû ji herêmê re çêbikin û li gorî berjewendiyên xwe vê yekê pêkbînin.

Di serî de hêzên mîna Tirkiyê û Îranê yên ku her yekî ji wan dixwaze serweriya xwe di heremê de biparêze û berfireh bike, ji vê rewşa heyî dixwazin sûdê bigrin û li gorî berjewendiyên xwe bikarbînin. Şerê di navbera Îsrayil û Hemasê de diqewime parçekî berjewendî û nakokiyên ku di navbera van hêzêan de ye. Ji ber ku li pişt Hemasê Tirkiyê ji milekî ve û Îran jî ji milekî din ve hene, herçiqasî herdû hêz di navbera wan de nakokî hebin jî, lê xalên ku wan dighînin hev jî hene û her yekî ji van hêzan dixwaze li ser xwîna gelê Filistînê siyaset û bazarî bike.

Erdoxan ji milekî ve xwe weke xwediyê gelê Filistînê dibîne û ji milekî din ve jî bazariya di navbera xwe û Îsrayilê de jî dimeşîne. Herwiha çawe ku Îsrayil Hemasê mîna hêzeke tûndrew dibîne û li hemberî wê dest bi êrişê kiriye û gelek dewletên cîhanê jî destek û piştgiriyê didin Îsrayilê. Dagirkeriya tirk jî dixwaze ku cîhan tev destekê bide wê an jî çavê xwe jê bigre dema ku êrişê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Dirûtiya ku Erdoxan dimeşîne roj bi roj ji cîhanê re işkere bûye û êdî ew xwe jî ji xwe bawernake. Herwiha di rewşa Sûriyê de dema ku bandora şerê di navbera Îsrayil û Hemasê de were nirxandin, şerê di navbera Emrîkiya û Îranê de hem li Sûriyê û hem jî li Iraqê hîn dijwartir bûye û her alî dixwaze şer li dûrî xwe bigre û aliyê din lawaze bike û eniya xwe ya şer berfirehtirbike. Li hmberî rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî li gorî ku tê xuyakirin siyaseta ku tê meşandin, ji milekî ve ger ku bikaribin wê hewil bidin ku Sistema heyî berbelav û bêbandor bikin, an jî li gorî berjewendiyên xwe li herêmê bikarbînin. Ji bona vê yekê û li gorî hemû rewşên ku muhtemelin bi berfirehbûna bandora şerê cîhanê yê siyemîn bi xwe re derxe holê, pêwîste ku hazirî û amedekarî li gorî wê werin kirin.

Herwiha dagirkeriya tirk dixwaze sûdê ji şerê Îsrayil û Hemasê bigre û bê navber êrişê heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û careke din gefa dagirkirina herêmên nû dide. Li hemberî vê yekê jî hem çalakiyên HPG’ê û hem jî çalakiyên QSD’ê û Hêzên Rizgariya Efrînê derbeyên mezin li hêzên dagirker didin û sekna gelê berxwedêr jî hişt ku pilanên qirkirinê yên hêzên dagirker bê encam bimînin.



# ‘Bi vîn û berxwedaniya gel wê dorpêç têk biçe’

Li Herêma Şehbayê ji ber dorpêça hikumeta Şamê cereke din jiyan rawestiya ye. Endamê Kombenda Efrîn a Civakî Xelîl Mihemed diyar kir ku ev nêzî 6 sala ne ku dorpêça hikumeta Şamê li ser gelê Efrîn û Şehbayê berdewam dike, armanca dorpêçê jî şikandina vîn û hêviyên gel e.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Efrên di sala 2018’an de piştî berxwedaniya 58 rojan ji hêla dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hat dagirkirin, ji ber vê yekê bihezaran gelên Efrînê koçberî Şehbayê bûn, niha jî li Şehbayê ji hêla hikûmeta Şamê ve gelê Efrînê tê dorpêçkirin û di tevahiya aliyên jiyanê zehmetiyên mezin tên jiyankirin.
Di derbarê dorpêça li ser Şehbayê endamê Kombenda Efrîn a Civakî Xelîl Mihemde ji Rojnameya me re axivî.

### Xurtbûna yekîtiya Kurdan

Xelîl Mihemed diyar kir ku bi armanca valakirina herêma Şehbayê ji gelê kurd, ev nêzî 6 sala ne dorpêça li ser gelê Efrîn û Şehbayê berdewam e û wiha got: “Vê dorpêçkirinê bikar tînin da ku vîna gel bişkînin û hêviya vegera gel li Efrînê têk bibin. Rizgarkirina Efrîn û vegera gel tenê bi berxwedanê pêkan e. Efrîn bi hevkariya hêzên navneteweyî hat dagirkirin, niha jî dixwazin dîmografiya Efrînê bugherînin. Dewleta Tirk a dagirker niha Filistîniyan tîne û wan li Efrînê bi cih dike, her wiha kurdên ku di Efrînê de mane jî gelek zexit li ser wan tê kirin, bi taybet dema demsala çandiniyê de baceyan li ser wan giran dikin, gava çinîna berhemên wan jî, ji sedî 75 çete ji xwe re dibin. Bi vî awayî dixwazin xelkê Efrînê yên resen ji wir derxînin. Bila dijmin baş bizanibe ku gelê Kurd




ne ew gelê berê ye, yekîtiyeke Kurdan ya mezin çêbûye, di heman demê de li Ewropayê û li her çar parçeyên Kurdistanê jî yekîtiya Kurdan çêbûye, di dîrokê de tu carî kurd di aliyê şer de nehatine şikestin, herdem di milê siyasî de dihatin xapandin, lê niha siyasetmedar û rêberên kurdan çêbûne, êdî xapandina me zehmet bûye, ji ber vê yeke divê kurd baweriya wan bi wan hebe da ku em bighin serkeftinê û Efrînê rizgar bikin.”

### Mirov bi axa xwe serbilind e

Endamê Kombenda Efrîn a Civakî Xelîl Mihemed dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: “Em bêdengiya raya giştî şermezar dikin, herêma Şehba ku gelê Efrîn xwe lê bi cih kiriye ne ji dema niha de hatiye dorpêçkirin, lê ew ji beriya 6 salan ve di vê dorpêckirinê de ye. Hêzên desthilatar yên navneteweyî piştgiriya dagirkeriya Tirk dikin û destekê didin wan. Heta ku ev dorpêc were şikandin yekbûna



me kurdaN pêwîste, ji nan û avê zêdetir kurd xwe bikin yek û mijara welatparêziyê bidin pêşiya xwe, tu kes wê nikaribe vîn û hêza Kurdan bişkîne, niha ya herî pêwîst yekîtiyeke mezin ya kurdan were çêkirin, û di karên diplomasî de em xwe bighînin gerdonê, li hember vê dorpêçkirin meş û bangewazî werin çêkirin, ji ber ku gelên Efrînê gelekî welatparêze û bi axa, ziman û dîroka xwe ve girêdayî ye, ji ber vê yekê dixwazin wan tune bikin, dijmin tu tişt di Efrînê de nehiştin û hemû berhemên wê dizîn e, heya bi berhemên dîrokê jî birin, herwiha jîngeha wê jî xirakirin, darên wê jî dibirin û dixwazin zimanê Efrîniyan jî tune bikin, bi riya vekirina wan ji ofîsan re têde zimanê tirkî didin, hêviya min ew e ku gelên Efrîn, Serêkaniyê û Girêspî vegerin ser axa xwe û bi azadî bijîn, ji ber ku gava mirov ji axa xwe derdikeve pê qîmet dimîne.”

## Biratiya kuştin û înkarkirinê!



**Zekî Bedran**

MGK (Lijneya Ewlehiya Netewî) a dewleta Tirk dawiya her mehê dicive û pirsgirêkên ewlehiyê dinirxîne. Piştî civînê daxuyaniyek pir kurt tê dayîn. Û weke zagonek xwidê di ragihandinê de cih digire. Ne kesek nîqaş dike ne jî rexne dike. Bi dehsalane MGK bi biryardarî binê şerê li hemberî Kurdan xet dike. Saziya bingehîn a biryarê ye ku dijminahiya Kurdan dike. Lê tu carî peyva Kurd bi kar nayîne. Diyar dikin ku dê çiqas bi awayek biryardarî “dijî terorê û parçebûnê” tê bikoşin.
Yên ku dewleta Tirk rêve dibin teqez naxwazin têgeha Kurd bikar bînin. Naxwazin Kurdbûn were bîra mirov û di aqilê mirovan re derbas bibe. Ji ber ku armanca wan a bingehîn qirkirina Kurdan e. Armanca wan a bingehîn ew e ku Kurdan neyî bihesibînin û wisa nêz bibin. Ji ber wê dema parlementerekî Kurd di parlementoya Tirk de bi Kurdî diaxive jî, weke zimanek nayê zanîn tê tomarkirin. Di belgeyên fermî de pevyên Kurd û Kurdî derbas nabin. Ji ber ku pergala çêkirine li ser înkarkirina Kurdan e û di dîrokê de tunekirin e.
Kurdan li ber xwe da û bendên înkarê şikandin. Lê di helwesta wan de tiştek nehat guhertin. Hevkarê hikumetê, yê ku rê dide pêşiya şer û hikumetan Baxçelî ma qet têgeha Kurd bikar tîne? Teqez bi kar nayîne. Dema bikar tîne jî teqez di aliyê xirab de, li ser bingehê êrişkirina HDP û partiyên din bikar tîne. Dema Erdogan jî dikeve tengasiyê dibêje “Birayê min ê Kurd.” Êdî biratiyek çawa ye ku bi kuştina ciwanên birayê xwe serbilind e. Ma mirov ziman û vîna birayê xwe qedexe dike, neyî dihesibîne? Kurd di sedsala 21’an de ji mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê jî bê par in. Hilbijartinên Kurdan ên li gorî zagonên Tirkan tên kirin û qezençkirin jî neyî tên hesibandin. Parlementer û serokên şaredariyên Kurdan weke “parçeker û endamê veşartî yê terorê” dixin girtîgehê û ceza dikin. Dewlet tevahî şaredariyên Kurdan desteser dike.
Derewa, li hemberî Kurdan cudakarî nayê kirin, li Tirkiyê her kes wekhev e, êdî eşkere bûye. Dîn û aqil jî, leşker û sivîl jî heman neqeretê dubare dikin. Halbûkî ev derew rastiyên di makezagonê de naguhere. Ne xwedî hêza guherînê ye. Di makezagonê de dibêje her kesê welatiyê Tirkiyê ye Tirk e. Li gorî ku Kurd jî hemwelatî ne ew jî Tirk in. Ev bi dehsalane hikmên vê makezagonê li cihê xwe ne. Ma Erdogan an jî hinekên din gotine ku em vê madeyê biguherin, înkar bi zagona biratiyê re li hev nake? Ma kesî daxuyaniyek wiha ji Erdogan bihîstiye? Na. Wê demê gotinên biratiyê ji derewekî wêdetir ne tiştek din e.
Li Tirkiyê yek vebijêrka biratiya bi Tirkan re û wekheviyê heye. Ew jî Tirkbûn e. Dema Kurdan Tirkbûn pejirandin wê demê dikarin bibin bira. Lê dema dibin Kurd, tenê dikarin bibin “parçeker, terorîst û dijmin.” Ji ber wê her civîna MGK’ê dibêje “Di hindir û derve de têkoşîna li jî xebatên parçeker û terorîst.”
Erdogan Efrîn dagir kir. Bêguman ev bê erêkirin û piştgiriya hêzên navnetewî nedibû. Di serî de jî Rûsya bi Erdogan re li hev kir û qada hewayî ya herêmê ji Tirkiyê re vekir. DYE û Ewropayê jî ev êriş temaşe kirin. Hat erêkirin. Piştî dagirkeriyê Efrînê rastî tunekirina nîjadî hatin. Mal û milkên wan hatin talankirin, ji destê wan hatin derxistin. Tu sûd û xirabî nema neanîn serê wan. Rûsyayê çi kir? Tiştek nekir. Piştî wê Trump jî bi Erdogan re li hev kir û herêmên weke Serêkaniyê ji dagirkeriyê re vekir. Kurd ji wir jî hatin derxistin. Malê Kurdan desteser kirin, çete û malbatên wan ên ji derve anîbûn li şûna wan bicih kirin. Bi vê re bergiriya careke din Kurd venegerin warê xwe kirin. Ev plan bi awayekî vekirî qirkirin e.
Erdogan beşdarî lûtkeya Ereb û welatên Îslamî dibe. Dev diavêje Israîlê! Dewleta Iraqê û Sûriyê jî endamên Yekîtiya Ereban in. Li herdu welatan jî dagirkeriya Tirk heye. Dagirkerî her ku diçe belavtir dibe. Dewleta Tirk êrişên xwe nerawestandiye. Di vê rewşê de pêwîst bû welatên Ereban li hemberî Erdogan helwest nîşan bidabûna û Erdogan nedana axaftin. Lê ka ew sekn li ku ye! Di ser de jî Erdogan bi karbidestên Iraq û Sûriyê re hevdîtin çêkir, ji bo êrişên nû yên li dijî Kurdan piştgiriyê dixwaze. Weke Yavûzê diz, welatên ku dagir kiriye dixe bin zextê da ku li dijî Kurdan alîkariya wî bikin.
Erdogan bi serbilindahî dibêje ku wan ji 2015’an ve 30 hezar Kurd kuştine. Dibêje min ji hikumetên din zêdetir Kurd kuştine. Kurdan û ciwanên wan dikuje û girêdana biratiyê ava dike! Ma kesê ku dixwaze bibe birê Kurdan û bi wan re bijî, biratiyê esas digire ma bi hezaran Kurdan dikuje? Gelo kuştin an jî lihevkirin û aştî li gorî biratiyê ye? Heta ku li Tirkiyê tevgerek muxalîf û demokratîk a van pirsan bike û bide nîqaşkirin nebe, dê xwînê birijînin, milyar dolaran bidin balefiran û bombeyan.
Erdogan piştgiriya Hemasê dike, dijberiya Israîlê dike, hewl dide bi vê ji aloziyê sûd werbigire û tevlîheviyan çêbike. Derdê wî yê esasî ew e ku şerê li dijî Kurdan bidomîne û atmosfera komkujiyan çêbike. Heman demê de li ser xwîna Filistîniyan dilîze, propogandayan dike û wan ji bo hilbijartinê bikar tîne!

## Meşa ‘Ji Rêber Apo re Azadî’



**Farûk Sakik**

Meşa “Ji Rêber Apo re Azadî” ku bi beşdariya bi milyonan kesên li Tirkiye, Kurdistan, Ewrûpayê bi kûrtasî li gelek deverên cîhanê dewam dike. Hejmara meşvanan jî roj bi roj zeêde dibin. Ev meş ji meş-hamle-kampanya-pengavên berê cudatir e. Di meşa îro de biryardariyek û bîrdoziyeke cuda ya encamgirtinê heye. Êdî têkoşîna azadiya Rêber Apo ne bi tenê erka Kurdan e. Li Tirkiyê û li cîhanê mirov azadiya Rêber Apo ji xwe re wek berpisyariyek dibînin. Gelo çima li derveyî Kurdan hin kesên din jî tevlî vê meşê dibin? Berxwedana Rêber Apo ya li dijî faşîzmê û paradîgmayên wî yên çareserkirina pirsgirêkên li heremê û li cîhanê diqewimin, dîtin û tevlî vê meşe bûn. Rêber Apo, ne bi tenê dijî faşîzmê têdikoşe, di heman demê de ji bo çareserkirina pirsgirêkên bi faşîzmê re derketine holê jî çareser bike, têdikoşe. Ji gelek welatên cîhanê demokrat, sosyalîst û jin dema ku behsa pirsgirêkên xwe dikin û li çareseriyan digerin, paradîgmaya Rêber Apo ya Modernîteya Demokratîk weke referans esas digirin. Ji bo vê yekê ev meşa azadiya Rêber Apo ya fizîkî ji aliyê van kesan ve, di 10’ê Cotmehê de hat destpêkirin. Roj bi roj jî hejmara wan jî zêde dibe.
Divê di vê pêngava nû de stratejiyeke cuda were pêşxistin. Divê Rêber Apo baş were nasandin. Divê fikr û ramanê wî, rêbaz û perspektîfên wî yên çareserkirina pirsgirêkan, bi civakê baş were îzahkirin. Çawa ku yên paradîgmaya wî xwendine tevlî vê meşê bûn. Heger xebateke bi vî rengî were meşandin wê hîn zêdetir kes tevlî meşê bibin. Jixwe di 10’ê Kanûnê de li gelek navenda wê pirtûkên Rêber Apo werin xwendin. Navendek meşa azadiya Rêber Apo zindanên Tirkiyê ne. Di 27’ê Mijdarê de me dît li zindanên Tirkiyê girtiyên siyasî jî tevlî vê meşê bûne. Girtiyên siyasî wek gelên Ewrûpa çareseriya hemû pirsgirêkan, di azadiya Rêber Apo de didîtin. Azadiya xwe çareseriya pirsgirêkên xwe yên zindanan, di azadiya Rêber Apo de didîtin.
Di salên berê de li zindanan armanca grevên birçîbûnê bi taybet ji bo bi destxistina mafên wan ên li girtîgehan tên binpêkirin bû. Dema ku dest bi çalakiyê dikirin, daxwazên xwe rêz dikirin. Lê ji sala 2012’an ve êdî wateya greva birçîbûnê hat guhertin. A niha bi yek daxwazî çalakî didin destpêkirin ew jî azadiya fizîkî ya Rêber Apo ye. Di sala 2012’an de 68 roj dewam kir û li ser daxwaza Rêber Apo bi dawî bû. Di sala 2019’an de çalakiya greva birçîbûnê ya bi Leyla Guven dest pê kir, li hemû zindanan belav bû. Hedefek grevê jî agahîgirtina ji Rêber Apo bû. Piştî hevdîtina parêzeran û peyama ji Îmraliyê hat, çalakiya xwe bi dawî kirin.
Di salên 90’î de jî çalakiyên bi vî rengî hebûn, dema li zindanan çalakî dest pê dikir, eniyek jî li ber zindanan dest pê dikir. Çalakiya greva birçîbûnê ya dest pê kiriye ji derve de jî piştgiriyeke mezin digire. Malbatên girtiyan li derve dibin dengê zarokên xwe. Îsal jî piştî ku çalakî li zindanan dest pê kir, malbatan “Nobeta Edaletê” dan destpêkirin. Faşîzm li Tirkiyê ne tenê zextan dide ser girtiyên siyasî, malbatên wan jî wek hedef digire.
Ji ber vê yekê ye, têkoşîna malbat û girtiyên siyasî bi hev re dest pê dike, an jî hev temam dike.